

QESÎDEYA BURDE

İMAM BÛSEYRÎ

WERGÊR
EBDUREHÎM CİZÎRÎ

Qesîdeya Burde
Ebdurehîm Cizîrî

Kapak Tasarımı
Dr. Enes Başak

Mizanpaj
Esma Nur Ayşe Çelik Başak

Editör
Fatih Kırmızıgöz

1. Basım, Temmuz 2022
SAGE Yayınları

Baskı ve Cilt:
SAGE YAYINCILIK VE MATBAACILIK
Kazım Karabekir Cad. Kùltür Çarşısı Kat: 2
No: 7/101-102-103
İskitler/Ankara

Tel.: 0312 314 00 02/05
bilgi@bizimdijital.com

NAVEROK

<i>Pêşgotin</i>	5
<i>Jîyana Îmam Bûseyrî</i>	10
<i>Beşa Yekemîn</i>	15
<i>Beşa Dûyemîn</i>	18
<i>Beşa Sêyemîn</i>	24
<i>Beşa Çaremîn</i>	35
<i>Beşa Pêncemîn</i>	40
<i>Beşa Şeşemîn</i>	46
<i>Beşa Heftemîn</i>	53
<i>Beşa Heştemîn</i>	58
<i>Beşa Nehemîn</i>	66
<i>Beşa Dehemîn</i>	71
<i>Mulheqatên Qesîda Burde</i>	74

JÎNEŊĠGARÎYA MELE EBDUREHÎM CIZÎRÎ

Mele Ebdurehîm Înanç di sala 1959'ê de li gundê Behmûrê ya ser bi navçeya Cizîrê ve ji dayîk bûye. Navê babê wî Şêx Elî ye, ew jî kurê Şêx Hacî ye. Perwerdeya xwe ya pêşî li cem babê xwe dest pê kiriye. Hêj di zaroktîya xwe de babê xwe wenda dikê. Dibistana seretayî li gundê xwe Behmûrê, dibistana navîn û lîse jî li Cizîrê diqedîne. Ferqa dersên Îmam-Xetîbê li Mêrdînê dide. Sala 1985'ê Fakulteya Îlahîyatê ya Zanîngeha Selçûk a Konyayê qedandiye. Sala 1979'ê li Camîya Mezin a li navenda Cizîrê wek muezîzîn-qeyyûm dest bi wezîfeyê kirîye. Paşê li gundê xwe ew wezîfe dewam kirîye. Sala 1988'ê li navenda Cizîrê wek îmam dest bi wezîfe dike. Sala 1992'yê wek muftî tayînî Qilaban a Şirnexê dibe. Piştî ku li deverên cur be cur ev wezîfe berdewam kir, di sala 2016'ê li navçeya Bünyana Qeyserîyê xanenişîn dibe.

Mele Ebdurehîm vê gavê li navenda Cizîrê îqamet dike. Demê xweyê vala bi ders dayîna feqîyan ve derbas dike. Li gel vê jî bi werger û hûnandina helbestan mijûl dibe. Zewicî ye û babê 10 zarokan e.

PÊŞGOTÎN

Hemd û sena ji bo wî Xwedayê ku temamê kaînatê ji bo me anîye der ji 'edemê,

Xêrtirînê mexlûqan Muhammed a.s.v. ji mere pêxember şandîye her ew e Xwedanê lutf û keremê,

Bi exlaqê wî yê xweş ilham daye şair û nivîskar û edîban, da ku bi pêûsên xwe her tim bidin medh û pesnê Resûlê hatî şandin ji bo temamê Alemê.

Selat û selamên Xweda li ser Pêxemberê me û al û zurîyeta wî bin li her zeman û al û demê.

Di cîhanê de edebîyat tişteki muşterek e. Mîna malê wendabûyî mirov dema dît, gerek mirov lê xwedî derbikeve. Berhemên edebî dema bi zimanekê bêne wergerandin, hem gelek faidê wan hene, hem jî dewlemendiya wî zimanê dide nîşandan.

Digel ku heya îro zimanê Kurdî nebûye zimanê fermî Jî, dema mirov berê didiyê bi naveroka xwe musaide, ji hemû şaheserê edebî re ku bi hêsanî pê bêne wergerandin.

Ev dewlemendiyeke zimanê Kurdî ye.

Dema mirov guh bide Ehmedê Xanî ew jî bi vê bîr û bawerîyê vê rewşê ji me re weha tîne ziman.

.....

.....

***Da xelqî nebêjtin ku Ekrad
Bê me'rifet in, bê esl û bunyad***

**Enwa'ê milel xwidan kitêb in
Kîrmancî tenê di bêhesêb in**

**Hem ehlê nezer nebên ku kîrmanc
'Îşqê nekirin ji bo xwe amanc**

**Têk da ne di talib in, ne metlûb
Vêk ra ne muhibb in ew, ne mehbûb**

**Bêbehre ne ew ji 'îşqibazî
Farix ji heqîqî û mecazî**

**Kîrmancî ne pir di bêkemaal in
Emma di yetîm û bêmecal in**

**Filcumle ne cahil û nezan in
Belkî di sefîl û bêxwedan in**

**Ger dê hebûya me jî xwidanek
'Alîkeremek, letîfedanek**

**'Ilm û hiner û kemal û iz'an
Şî'ir û xezel û kitab û dîwan**

**Ev cinsî biba li ba wî me'mûl
Ev neqdî biba li nik wî meqbûl**

**Min dê 'elema kelamê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn**

**Bîna ve rûha Melê Cizîrî
Pê hey bikira 'Elî Herîrî**

Keyfek we bida Feqiyê Teyran
Hetta bi ebed bimayî heyran

Çi b'kim ku qewî kesad e bazar
Nînin ji qumaşî ra xerîdar.

Min jî bivan hestan ku zimanê kurdî digel ku ev qeder bê xwedî maye û hêj standardekî bingehîn jî jê re çênebû ye, min xwest vê berhema namîdar û edebî hatî nivîsandin, dîsa bi nezm wergerînim Kurdî.

Bi rastî min tu caran xwe qabilê vî karî nedîtibû. Lewre min ne zimanê şîrê û ne jî perwerdehiya zimanê Kurdî nekirî bû. Ez di vî warî de deyndarê dayîka xwe bi tenê me.

Bes bawerîye min heye ku di nav rûpelê dîrokê de gelek seksîyetên mixabin û zana û tê geheştî hene ji ber ku tiştêk nenivîsîne, wendane û kes bi wan nizane. Heger îro şanazîyên xwe bi Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî dikin, sebeb ev e ku ewan berhemên giranbûha bi şûn xwe hêlane. Xwe nemir hiştine. Ne xwe pêwîste çi ji mirovan bê, gerek mirov paşde nehêle û da bibe cesaret ji bo kesên dî.

Ji aliyê dî ve qaîdeyek wesa jî heye ku têye gotin

ما لا یدرک کله لا یترک کله

“ Tiştên ku mirov nekaribe bi temamî bi dest xwe bêxe pêwîste mirov hemûyê ji dest xwe berne de”

Ev zimanê ev qeder bê xwedî mayî kî bikaribê çi xizmetê jê re bike gerek bike şunde nehêle.

Hem ji xort û qîzên me re jî, da bizanin kû berhemên edebî bi zimanê wan tê nivîsandin.

Dîsa Ehmedê Xanî bi van hestan dibêjit

*Xanî ji kemalê bêkemalî
Meydanê kemalê dîte xalî*

*Ye'nî ne ji qabil û xebîrî
Belkî bi te'essub û 'eşîrî*

Xanî bi van beytande hişyarîyê dide me da ku em jî wek hemû milletan li zimanê xwe yê dayîkê xwe xwedî derkevin û zimanê xwe di warê edebî de bixebitînin.

Ez dizanim vî warî de kêmasîyên min pir in. Dîsa jî dixwazim li goreyî xwe, xizmeta vî zimanî û xwedîyê vî zimanî -ku gelê Kurd in- bikim. Dîsa dixwazim heval û xwendevanên dilxwaz di kêmasîyê min de min hişyar bikin. Ez jî wê gelek pê kêfxweş bibim. Eger Xweda bike nexsîb, di pêşerojê de ez ê van hişyarîyê wan ji xwe re bikim rehber û pê bimeşim.

Min bi xwe 35 salan karê fermî yê dewletê kirîye. Dema min şî'ir di xwandin, ez pê kêfxweş dibûm. Hêj ku zaro bûm miftîyê Cizîrê yê namîdar Mehmud Bilge ev Qesîdeya Burde çend malik çêkiri bûn min bi zewq dixwandin.

Min berê xwe da Qesîdeya Burde gelek zimanan hatîye terceme kirin û şerh kirin: min ji xwe re got, gelo ez jî dê bikarim bi zimanê Kurdî û binezm li ser ya Mehmud Bilge bi 'eynî uslûbê dewam bikim yan na?

Netîceyê de Mehmud Bilge Beşa yekem qedandi bû. Min bidest ya wî nedaye. Lê belê, eslê wê yê Erebi min danîye ser serê malikan. Ji vir pêde heta dawîyê min çêkirîye.

Di vê berhemê de, me ev rêbaz te'qîb kirî ye. Orjînalê Erebi me danî serê malikan paşê jî kurdîya wê ya menzûm me dibin orjînalê wê de danî. Paşê jî ji bo xatîrê îstîfade baş jê çêbê, me şîrove ango izah kir.

Ev Qesîdeya Burde di pitirînên nuxseyan de sed û şeşt (160) malik'in. Heft (7) malik jî mulheqatê wê hene. Ev heft malik me danîne dawîyê belê me ew şirove nekirine. Bi izna Xweda qedîya ev berhema berdestê we bi vî awayî xelas bû. Belê di vî karê xwe de ez behsa şaxsîyete kê nekim nikarim derbas bibim ev jî mamoste Tahir Sîdar e.

Di rastnivîs û redexîyona vê pirtûkê de mamosteyê xanenişîn Tahir Sîdar, gelek arîkarî daye min û xwe bi min ve westandîye. Ez gelek sipasîyê ji bo wî dikim.

Ez hêvîdarim ji dost û hevalan, ku xetayên min bi şeklekî dilxwaz ji min re bibêjin.

Kê m û kas hebin ew ya mine. Tewfîq ji teref Xweda ve ye.

Hûn dikarin bi xwendina koda QR ya jêrîn ji tîlefona xwe guh bidin guhertoya dengî ya pirtûkê.

